MIN BIKUJE

Bihar Berzincî

Min tam nekiriye mirinê
Lê min tam kiriye û ez nêzîkî mirinê bûyîme
Tu … bi bihatirîn tişt bûyî li ser rûyê erdê
Erê, raste em jêkvebûyîn?
Raste hemû tişt mirin li ser rûyê erdê
Erê raste ez mam bi tinê?
Li te digerim, li hemû semt û rex û rûya
bi dirêjî û firehiya
Raste te, ez li paş xwe hêlêm
Û ez pirte belave bûm
Evro xwe lêkdam

* * *

Spêdê ji xwe radibim, ji xeyrî roja xwe nabînim
hest bi xeribiyê dikim û dil sar dibît
Ez: pê dihesim hêşta sax im û du pirbûna te kabûsek bû di şeveka rêving de
Xemên min hêşta yên di cihê xwe de, li gel ketwarekê tu tê de ne

çavên xwe dinevînim
çi tişt piştî te min ji xwe narakin
* * *
Destê xwe dihavêjim mobayilê,
li xezîneka nama digerim
Belku peyvek gehiştiye min!
Lê pa;
Tinê reşekê ji te dibînim
Dûrî xwe dihavêjim
Li ser textê bê deng dibim
Serê xwe diêxim di nav çûkên
xwe de û dilerizim…digirîm
Xwe dibînim tifaleka sava û
nivistî
Li ber singê dayîka xwe
hişyar dibim
Tine xwe sêwî dibînim
* * *
Berev qudîkê ve diçim
digirnijim bo wênê xwe
Xwe nas nakim û min viya
bêjimê tu kî?
Ez tirsiyam û min got:
Eve ez im!
Lê pa, mezintire ji min
Por spî ye
Rûkên wê qurmiçîne!
Lê dêmê min berzetiya erdî tê
de ye
Geşe weku biharê
Tirsê girtim…
* * *
Raste dûrbûna te ez êxistim di
şevekê de
Li bihara jiyê min kire payîz
Nizanim,
Eve lêkdana dûrbîniyê ye, yan
jî çirmisîna perîşaniyê ye
Erê ev çirmisîne posîdeye
Yan xiyaneta payîzê ye bo
biharê
Hêdî, hêdî
keziyên xwe min vehînan û
bi girnijîneka pêtî li ser lêva û
xweştirîn gulav min li xwe kir
Ewa te bo min hinartî rojekê li
gel kefîkeka binevşî
* * *
Û li wêra he…
Babe kal pê rûniştî
Ewê jiyana xwe gorî min kirî
Min xwe havête singe wî û ez
kenîm
Belê, ji nav de
Digirîm û dikelim ewî
Hest bi hemû tiştan kir
Serê min dayna li ber singê xwe
Û gote min,
Jiyan berdewame babo!
Min kire girî û min serê wî
maçî kir û
Ez bi tirimbêlê çûm
Bêyî ku bizanim bo kî ve
Ya ji min ve ez a li xwe digerim
Heta westiyam …!